KANÛN 2023 Hejmar-1

infoWelat.com

# KURDISTAN

## SIYASETA SIVÎL HILWEŞIYA

Necat AYAZ 3

## MEDYAYA KURD Û ASÎMÎLASYON




Ronî RIHA 9



Rênas JIYAN 7

## KURD Û AMERÎKA Û ÎSRAÎL

## PKK JI BO SERXWEBÛNÊ HAT DAMEZRANDIN

5

11

## “DOKTRÎN TUNEL Û ŞERÊ GERÎLA YE

# Naverok

**Siyaseta sivîl hilweşiya.........................................................3**
*Necat Ayaz*

**PKK ji bo serxwebûnê hat damezrandin................................5**
Infowelat

**Kurd û Amerîka û Îsraîl...........................................................7**
*Rênas Jiyan*

**Medyaya Kurd û asîmîlasyon.............................................9**
*Ronî Riha*

**Doktrîn şerê tunel û gerîla ye...........................................11**
*Infowelat*

**Kurd Rojhilatê Kurdistanê tenê hiştin...........................12**
*Infowelat*

**Dema Britanya piştgiriya şerê qirkirina Kurdan kir.......15**
Rojevakurd

**Konfederalîzma Kerkûkê û serdestiya Iraqê..................18**
Necat Ayaz

**Hannibal Kurd û Demokratîkbûna Tirkiyeyê.................20**
*Ali Engin Yurtsever*

**Kurdistan warê çandiniya genim e .................................21**
*Infowelat*

## DERBAR

Kurdistan berhemeke mehane ya Infowelat e. Self-determînasyon û bi taybetî jî parastina kurdî mijarên sereke yên Kurdistanê ye.

Înfowelat di 2013'an de wekî malpereke tematîk hat damezrandin. Civakên ku xwe bi rê ve dibin, parastina ziman û hemû mijarên derbarê mafên neteweyî de di çarçoveya xebata malperê de cî digirin. Herwiha, nûçe û gotarên di derbarê rewşên jeopolîtîk de û bandora wan a li ser mirovahiyê mijarên din ên malperê ne.

Înfowelat li ser van mijarên spesîfîk xebatê dike:

- Federalîzm, otonomî û modelên lîberter ên xwerêvebirinê.
- Rola ziman a di têkoşîna neteweyî de û têkiliya wê ya bi nasnameya ziman re, herwiha rê û rêbazên parastina zimanên hatine marjînalkirin.

Li Bakurê Kurdistanê Kurdî pir bi lez ji holê radibe û di vê kontekstê de yek ji armancên Înfowelat, lêxistina defa hawarê ye.

Piraniya naveroka Înfowelat bi Kurdî tê weşandin. Lêbelê, hin hevpeyvîn û naverokên din bi Îngilîzî di malperê de cî digirin.

Înfowelat malpereke serbixwe ye û têkîliya wê bi tu partî û rêxistinên siyasî re tune ye. Herwiha, malper ne di bin bandora tu hukumet û şîrketan de ye.

infowelat.com
Edîtor: Necat AYAZ
Rûpelsazî: ErdWEB
Redaksiyon:Serhed AŞTÎ
Têkîlî: info@infowelat.com

# SIYASETA SIVÎL HILWEŞIYA

Necat AYAZ

***Di dîroka siyaseta legal de careke din elîtên siyasî yên Kurd ji bo berjewendiyên xwe doza neteweyî avêtin ser sergo.***

***Di berdêla vê de, ji bo bikaribin patronaja xwe li ser hemû derfetên siyasî bidomînin, KCK ji wan re lembeya kesk vêxist.***

Partiya Herêman a Demokratîk (DBP) di 5'ê Mijdarê de li navçeya Baxler a Amedê konferansa xwe li dar xist.Beriya vê bernameyê hêvî ev bû, partiyê li rexne û pêşniyazên gel guhdarî bike û vê yekê bike bingeha xebatên xwe. Piştî têkçûna tevgera legal a Kurd a di hilbijartina Gulanê ya 2023'an de ku bê şert û merc piştgiriya namzetê serokatiyê yê Kemalîst Kiliçdaroglu kiribû, reaksiyonên gelê Kurd zêde bûbû.

Lewma partiyê soza guhdarîkirina daxwazên gel dabû û ji bo vê jî bi mehan civînên gel lidarxistibû. Ji ber vê yekê, gelek kes bawer kiribûn wê YSP û DBP encamên civînan bikin bingeheke polîtîkaya xwe. Pêşiyê YSP'ê bi kongereya xwe ya di 15'ê Cotmehê de nîşan dabû, daxwazên gel ji bo wê ne girîng in. Partiyê di kongreyê de navê HEDEP'ê li xwe kir û paradîgmaya KCK'ê qebûl kir. HEDEP gaveke din jî pêş de çû û di 100 saliya Komara Tirkiyeyê de banga Komara Demokratîk kir.

Hêviyên miletê Kurd yên ji HEDEP'a li paytexta komara kolonyalîst têk çûbû, zîvirîbû paytexta Kurdistanê. Mixabin bûyera li Enqereyê pêk hat, li Amedê dûbare kir û tekane partiya Kurd a li Kurdistanê birêxistinkirî ye, bi tevahî paradîgmaya KCK'ê qebûl kir.Eger bi vê partiyê re nûbûn an guherîneke hebe, ew jî di konferansê de bikaranîna Kurdî bû.Hevserokên partiyê bi Kurdî axaftinên xwe kirin û belgeya helwestê ya partiyê bi Kurdî-Tirkî hat pêşkêşkirin.

## Belgeya helwestê an belgeya stûxwariyê?

Belgeya helwestê ya DBP'ê bi naveroka xwe ya pir kûr a îdeolojîk, dûrî realîteya heyî ya Bakurê Kurdistanê û strûktûra siyasî ya partiyê bû. Partiyê belgeya mişt ji peyvên "li dijî tecrîdê berxwedan", "têkoşîna bîrdozî", "mîsyona şoreşa jinê","moderniteya kapîtalîst" û "moderniteya demokratîk" û hwd. hatibû dagirtin, qebûl kir.

***Meseleya Jinê 30, Modernîteya Kapîtalîst 14, bîrdozî 14, parastina ekolojiyê (xwezaparêzî) 13, Ocalan 10, Kurdistan 12, Kurdî/ziman 4 car di belgeya helwestê de cî girtin.***

Hejmara van peyvan a di seranserê tekstê de wiha bûn: Meseleya Jinê 30, Modernîteya Kapîtalîst 14, bîrdozî 14, parastina ekolojiyê (xwezaparêzî) 13, Ocalan 10, Kurdistan 12, Kurdî/ziman 4. Lewma belgeya helwestê ji ya partiyeke legal a Bakur bêtir, wekî belgeyeke KCK'ê bû.

## Statuya Kurdistanê lê çawa?

Di belgeyê de di çend ciyan de qala "statuya Kurdistanê" hat kirin lêbelê di derheqê forma statuyê de tu pêşniyaz cî negirtin. Meseleya statuyê bi vê hevokê di belgeyê de cî girt:

"Konferansa me, biryara xwe dubare kiriye ku wek mafekî jêneger ê gelê Kurd, heta daxwaza statuyê pêk were, dê ev daxwaz her roj hinekî din bê xurtkirin"

## Parastina Kurdî lê çawa?

Kurdî nebû mijareke esasî ya belgeyê û bi tenê di nava "polîtîkayên înkarê" de ji xwe re ciyekî pir biçûk dît."Kurdî" di belgeya DBP'ê de bi tenê du ciyan de û "ziman" jî dîsa bi du peyvan derbas bû. Bi van gotinan polîtîkayên înkarê ya dewleta Tirk hat rexnekirin:

"Her çiqas di encama têkoşîna ku gelê me bi berdêlên giran daye de êdî bîrdoziya fermî nikaribe bi awayekî vekirî nasnameya Kurd înkar bike jî, li hemberî Kurdî û çanda Kurdan polîtîkayên înkarê bi konetî û xasûkî didomîne."

Tunekirina Kurdî wekî hedefeke krîtîk a dewletê nehat terîfkirin û tevlî talana dewletê ya li hember xwezaya Kurdistanê ciyê xwe girt. Tespîta "qirkirina çandî" hat kirin lê di dewsa terîfkirina rêbaza berxwedana li hemberê wê, vê mijara krîtîk di nava vê hevoka giştî de winda bû:

"Konferansa me, li hemberî qirkirina çandî, qirkirina xwezayê û qirkirina civakî ji bo ku birêxistinbûna cewherî ya gelê me bi pêş bikeve, li tevahiya tax û kuçeyan li hemberî axayên madeyên hişbir û fuhûşê birêxistinbûn çêbibe, geşkirina têkoşîn û berxwedanê wek peywirekê daniye ber xwe."

*HEDEP'ê di kongreya xwe de bersiveke negatîf da vê daxwazê û paşê jî banga "Komara Demokratîk" kir.*

*DBP'ê jî bi konferansa xwe da ser heman xeta entegrasyonîst ku gav bi gav bingeha neteweyî ya gelê Kurd tune dike*

## Rizgariya Abdullah Ocalan

Di belgeyê de kapîtalîzm bi perspektîfên îdeolojîk ên her carî hat nirxandin û berpirsê hemû problemên li Rojhilata Navîn û li cîhanê hat sûcdarkirin. Paşê jî DBP'ê "modernîteya kapîtalîst" di nava qeyranê de nîşan da û ji bo çareserkirina problemên ew bûye sebeb"moderniteya demokratîk" pêşniyaz kir. Ev pêşniyaz bi van hevokên klasîk ên ji paradîgmaya KCK'ê hatibû girtin, hat formûlekirin:

"Bi zanîna ku tekane rêya çareseriyê moderniteya demokratîk e, girîngiya sepandina hişmendî û Paradîgmaya Demokratîk, Xwezaparêz û Azadîparêziya Jinê ya ku Rêzdar Abdullah Ocalan pêşkêşî mirovahiyê kiriye hat kirpandin."

Di heman tehlîlê de netewdewlet wekî sebebê netewperestî, nîjadperestî, olperestî, faşîzm û hemû xirabiyên li rûyê erdê hat nîşandayîn û "konfederalîzma demokratîk" wekî alternatîfa wê hat pêşniyazkirin.

Ev hevoka bi perspektîfa îdealîzekirina têkiliyên Kurd û Tirkan hatiye nivîsandin, xwedê du probleman e: Yekemîn, bi hevkariya li Milazgirê ya bi Selçûkiyan re, deriyên Kurdistanê û Anatolyayê ji Tirkan re vebû. Li aliyekî din, wekî di daxuniyê de cî digire, têkiliyên Kurd-Tirk di tevahiya dîrokê de erênî nebûn. Ji 1838'an û pê ve, bi reformên xurtkirina sîstema navendî, ji Başûr heta Bakur Kurdistan bûye navenda şer. Dewleta Osmanî bi tedbîrên giran ên leşkerî serhildanên Mîr Mihemed, Ubeydullah û Bedirxan têk bir û hebûna xwe li Kurdistanê xurt kir.

## Mîsyona şoreşa jinê

Di belgeyê de meseleya jinê piştî tehlîla "moderniteya kapîtalîst" ciyê herî zêde girt. "Azadiya jinê" bi perspektîfeke paradîgmatîk a tevlî civaka demokratîk û xweparêz ket belgeyê. Belavkirina "hişmendiya jina azad" a li hemberê "kapîtalîst, faşîst û desthilatdarperest" hat pêşniyazkirin.

Herwiha, di navbera jin û mêr de avakirina "têkiliyên azad û wekhev" wekî hedefeke din a belgeyê bû

## Bîrdozî, bîrdozî û bîrdozî

Yek ji peyva ku mora xwe li belgeya helwestê xist bê human "bîrdozî" bû. "Hegemonyaya bîrdozî", "têkoşîna bîrdozî" û "êrişên bîrdozî" çend ji peyvan bûn ku di vê mijarê de hatin bikaranîn. Di dawiya tehlîla li ser meseleya bîrdoziyê de ev armanca xwedî îdîayeke mezin cî girt:

"Konferansa me, dê li hemberî êrîşên bîrdozî yên bîrdoziya fermî ya ku hebûna xwe li ser nebûna gelê Kurd ava kiriye û hevkarên wan ên ku bi teşe û gotinên cuda didomînin, têkoşîna bîrdozî û şoreşa hişmendiyê ya ku nirxên gelê me yên dîrokî, civakî û çandî di hemû şert û mercan de bi pêş dixe û diparêze, bê navber bidomîne."

## Qeyûm tunebûna her tişt xweş bû

Ber bi dawiya belgeyê de meseleya qeyûman û reaksiyonên li dijî wan hat îfadekirin. Di belgeyê de reaksiyonên hişk li hemberê qeyûmên belediyeyan bi dest xistin, hat nîşandayîn.Têkoşîna li dijî qeyûman wekî "peywireke neteweyî" hat pênasekirin û ev gotin hatin kirin:

"Konferansa me, li hemberî sepana qeyûman a ku mêtingerî û koletiyê li ser gelê me ferz dike, di serî de mafên statu, xwebirêvebirin, hilbijartin û hilbijirînê, parastina tevahiya destkeftiyan, wek peywireke neteweyî nirxandiye."

Di derbarê modela elîtîst a hiyerşîk a belediyeyan ku gel tevlî proseya rêvebirinê nekir û talana çavkaniyên Kurdistanê ên bi destê rêvebiriya belediyeyan hat kirin, yek gotinek nehat gotin.

## Teslimiyeta elîtên polîtîk

DBP bi konferansa xwe ya li Amedê bendewariya guherînê ya gelê Bakurê Kurdistanê vala derxist. Piştî têkçûna di hilbijartina 2023'an de, pêdivî bi stratejiyeke neteweyî ya ji bo gelê Kurd hebû. Lêbelê ewil HEDEP'ê di kongreya xwe de bersiveke negatîf da vê daxwazê û paşê jî banga "Komara Demokratîk" kir.

DBP'ê jî bi konferansa xwe da ser heman xeta entegrasyonîst ku gav bi gav bingeha neteweyî ya gelê Kurd tune dike.Ev jî li ser bingeha "neteweya demokratîk" û "komara demokdatîk" bilind dibe ku armanca wê entegrekirina Kurd û Kurdistanê bi Tirkiyeyê ve ye.

A rast, di dîroka siyaseta legal de careke din elîtên siyasî yên Kurd ji bo berjewendiyên xwe doza neteweyî avêtin ser sergo. Di berdêla vê de, ji bo bikaribin patronaja xwe li ser hemû derfetên siyasî bidomînin, KCK ji wan re lembeya kesk vêxist.

# PKK JI BO SERXWEBÛNÊ HAT DAMEZRANDIN



> ***PKK ji destpêkê ve Kurdistanê wekî welatekî kolonî pênase kir û rizgariya neteweyî wekî armanca sereke da pêşiya xwe. Kurdistana serbixwe ya yekgirtî ya xwedî sîstema sosyalîst bû hedefa partiyê û şerê gerîla wekî rêbaz hat qebûlkirin.***

Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) 45. salvegara damezrandina xwe pîroz dike. Partî 27 Mijdara 1978'an li gundê Fîsê ya bi ser parêzgeha Diyarbekirê/Amedê hat damezrandin. Piştî damezrandinê, rêxistinê xebatên xwe yên li bajarên Kurdistanê zêde kir û di demeke kurt de li navenda Batmanê û li hin navçeyên Ruhayê bû xwedî hêzeke girseyî.

Pêşengên PKK'ê xwendekarên Kurd ên çepgir ên zanîngehên li Enqereyê bûn. Abdulah Ocalan bi zanebûna xwe, di nava van xwendekaran de derket pêş û rêberiyê ji bo pêkhatina koma bi navê Şoreşgerên Kurdistanê re kir. Heman kom bingeha partiyê ya di bin lîderiya karîzmatîk a Ocalan de qebûl kir.

PKK ji destpêkê ve Kurdistanê wekî welatekî kolonî pênase kir û rizgariya neteweyî wekî armanca sereke da pêşiya xwe. Kurdistana serbixwe ya yekgirtî ya xwedî sîstema sosyalîst bû hedefa partiyê û şerê gerîla wekî rêbaz hat qebûlkirin. Tevî vê jî, PKKê bi hinceta bi dewletê re hevkariyê dikin, ewil berê xwe da elîtên eşîrên li Siwêreg û Hîlwanê.

> ***Serfiraziya şerê gerîla ya di salên 1990an de, li bajaran tirsa ji rejîma kolonyalîst hilweşand û PKKê xwe di nava bi milyonan de birêxistin kir. Ev bingeha xurt a gel bandorê li hilbijartinan jî kir û partiyên legal ên Kurdistanî cara ewil ketin Parlamentoya Tirkiyeyê.***

## Damezrandina ERNK û ARGK

Piştî derbeya leşkerî ya 1980'an a li Tirkiyeyê, PKK vekişiya derveyî welêt û bi alîkariya Filistîniyan bû xwedî kampeke leşkerî. Partiyê bi dûv amadekariyeke dirêj, di 15ê Tebaxa 1984'an de li dijî dewleta Tirk şerê gerîla da destpêkirin. Salek piştî êrişên bi ser Dihê (Erûh) û Şemzînanê ve, Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ERNK) hat damezrandin. Di 1986'an de jî Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê (ARGK) hat damezrandin û ev hêza çekdarî dewsa Hêzên Rizgariya Kurdistanê (HRK) girt.

Şerê gerîla ya di bin fermandariya Mahsûm Korkmaz (Egît) de serfiraziyên mezin bi xwe re anî û gerîla belavî çar aliyên Kurdistanê bû. Li gorî pêdiviyên şer, li Bakurê Kurdistanê eyalet û herêm hatin damezrandin û rêvebiriyeke leşkerî ya qadî derket holê. Paşê bi hemleyeke polîtîk, ji welatparêzan meclîsên eyaletan hatin damezrandin.

*Encamên Şerê Bajaran ji bo PKKê û bi giştî jî ji bo Bakurê Kurdistanê hilweşîner bû. Dewleta Tirk bi riya qeyûman belediyeyên Kurd desteser kir û siyaseta legal xist bin dorpêçeke hişk. Li Kurdistanê zextên li dijî hemû xebatên demokratîk derket asteke herî bilind û tevgera gel hat pasîfîzekirin.*

*Di 1999'an de bi banga Ocalan gerîla ji Bakurê Kurdistanê vekişiya û pişt re ERNK, ARGK û PKDW yek bi yek ji hev hatin xistin. Ji ber van guherînan bi hezaran gerîla, kadro û xebatkarên din terka PKK'ê kirin.*

## Bajar, girseyîbûn û derveyî welêt

Serfiraziya şerê gerîla ya di salên 1990an de, li bajaran tirsa ji rejîma kolonyalîst hilweşand û PKKê xwe di nava bi milyonan de birêxistin kir. Ev bingeha xurt a gel bandorê li hilbijartinan jî kir û partiyên legal ên Kurdistanî cara ewil ketin Parlamentoya Tirkiyeyê. Di heman demê de li seranserê Kurdistanê nêzîkî 100 belediye ket destê partiya legal a kurd.

Doza rizgariya Kurdistanê ket rojeva cîhanê û dewleta Tirk her ku çû rastî reaksiyon û bertekan hat. Parlamentoya Kurdistanê li Derveyî Welat (PKDW) wekî ceribandike di riya hukumeteke Kurdistanê de li Ewrûpayê hat damezrandin. Ev gav bi tena serê xwe li cîhanê têra xwe deng veda.

## Piştî girtina Ocalan

Ocalan bi planeke dewleta Tirk û hevkariya sîstema navneteweyî di 1998'an de neçar ma terka Sûriyeyê bike. Tu welatên cîhanê deriyên xwe ji Ocalan re venekir û lîderê PKKê di 1999'an de teslîmî dewleta Tirk hat kirin. Girtina Ocalan û lêpirsîna wî ya li Îmraliyê di nava rêxistinê de bû sebeba şokê û hêrsê. Ocalan di çend salên ewil ên di girtîgehê de paradîgmaya Konfederalîzma Demokratîk pejirand û tezên jiyana hevpar a bi gelê Tirk re pêşxist. Di paradîgmaya nû de terka hedefa Kurdistana serbixwe hat kirin û di dewsa wê de "Xweseriya Demokratîk" a di bin banê "Komara Demokratîk" Tirkiyeyê de hat bicîkirin.

Di 1999'an de bi banga Ocalan gerîla ji Bakurê Kurdistanê vekişiya û pişt re ERNK, ARGK û PKDW yek bi yek ji hev hatin xistin. Ji ber van guherînan bi hezaran gerîla, kadro û xebatkarên din terka PKK'ê kirin.


## Proseya aştiyê û Şerê Bajaran

Di 2012'an de hukumeta AKP'ê ya di bin serokwezîriya Tayip Erdogan de piştî hevdîtinên bi Ocalan û PKKê re biryara "Proseya Çareseriyê" da. Parlamentoya Tirkiyeyê di 2014'an de ji bo meşandina vê proseyê qanûnekê qebûl kir. Têkiliyên her du aliyan ji ber şerê li Kobanê xera bû û piştî serkeftina hilbijartinê ya HDP'ê, dewleta tirk bi kez daxwaza xwe ya ji bo çareserkirina meseleya Kurd a bi riyên aştiyane winda kir.

PKKê bi şerê li bajarên Kurdistanê bersivê da dewleta Tirk û ev jî êrişeke mezin a artêş û hêzên din ên ewlekariyê bi xwe re anî. Tevahiya taxên bajaran ên berxwedana çekdarî lê pêk hat ji aliyê dewleta Tirk ve hatin hilweşandin. Piraniya wan sivîl û mîlîsên welatparêz di ser 2500î re kes hatin kuştin.

## Li Bakur şikestin

Encamên Şerê Bajaran ji bo PKKê û bi giştî jî ji bo Bakurê Kurdistanê hilweşîner bû. Dewleta Tirk bi riya qeyûman belediyeyên Kurd desteser kir û siyaseta legal xist bin dorpêçeke hişk. Li Kurdistanê zextên li dijî hemû xebatên demokratîk derket asteke herî bilind û tevgera gel hat pasîfîzekirin. Dewletê bajar û wargehên wekî keleyên PKKê dihatin qebûlkirin, bi tevahî xist bin kontrola xwe. Paşveçûna tevgera gel a demokratîk bandorê li şer jî kir û HPG neçar ma piraniya hêzên xwe vekişîne Başûrê Kurdistanê. Dewleta Tirk vê carê berê xwe da Başûrê Kurdistanê û herêm bû qada sereke ya şerê PKK û dewleta tirk.



Navendên Şerê Bajaran lê pêk hatin. /Harîte: Koma Krîzê ya Navneteweyî (ICG)

# KURD Û AMERÎKA Û ÎSRAÎL



Foto: Xwebûn

**Rênas jiyan**

> ***Divê kurd siyasetê bi hiş û aqilê xwe bikin ne bi hîs û ramanên xwe yên teolojîk û îdeolojîk. Siyaseta teolojîk û îdeolojîk bi kurdan dide windakirin.***

Ji bo azadiya Kurdistanê welatên kapîtalîst an jî sosyalîst kî piştgiriyê bide kurdan ev hêja ye. Kurdên polîtîk bi piranî xwe çepgir dihesibînin lê ji dewletên sosyalîst kurdan heta niha tu xêr nedîtiye. Helbet ev ne gunehê fikra sosyalîzmê ye, sosyalîzm pergaleke civakparêz e lê dewletên sosyalîst xerab in, bi kêrî azadiya gelên bindest nayên. Di avakirina herêmên Başûr û Rojavayê Kurdistanê de piştgiriya Amerîkayê çêbû, ne ya dewletên sosyalîst ên wek Çîn û Kore û hwd. Amerîka dewleteke kapîtalîst e lê dîsa jî alîkariya wê gihaşt kurdan, ev nikare bê înkarkirin. Helbet wê armanc û berjewendiyeke Amerîka di vê piştgiriyê de hebe, bila hebe; di vir de ya girîng berjewendiya Amerikayê ji bo azadiya kurdan dibe astengî yan na. Na, nabe astengî. Ger berjewendiya Amerîka ji kurdan re bibûya astengî tabloya siyasî ya herêmê bi vî rengî di lehê kurdan de nedifesilî.

Hevalbendiya kurdan û Amerîkayê ji bo herdu aliyan jî baş e. Wê çaxê divê bidome. Dewleta tirk dike nake nikare li herêmê bibe hevalbendê Amerîkayê, welatên ereb gelek jê hevalbendên Amerîka ne, wê çaxê çima ji bo berjewendiyên xwe yên neteweyî kurd nebin hevalbendên Amerîkayê?

Di Amerîkayê de ya ku mirov qîmet bidê ne kapîtalîzm e, federalîzm e. Federalîzma Amerîkayê pergaleke

> ***Di Amerîkayê de ya ku mirov qîmet bidê ne kapîtalîzm e, federalîzm e. Federalîzma Amerîkayê pergaleke girîng e. Divê mirov guh bide vê tecrûbeya federal.***

girîng e. Divê mirov guh bide vê tecrûbeya federal. Kurd û Amerîka di federalîzmê de dikarin bigihêjin hev û bibin hevkar. Heke hin kêmasiyên wê bên çareserkirin ji federalîzma Amerîkayê pergaleke baş a polîtîk

dikare derkeve holê. Federalîzm dikare bibe hevbeşî û bingeha amerîkiyan û kurdan. Hem kurd û hem jî amerîkî du gelên federal in.

Amerîka ji Sovyeta sosyalîst bêtir bi kêrî kurdan hat. Sovyeta sosyalîst komara kurd Mehabad bi erzanî firot. Di rûyê Sovyetê de ev dewleta kurdan xera bû. Dîsa heman Sovyeta sosyalîst bû ku piştgirî da Mustefa Kemal û bi xêra wê piştgiriyê dewleta tirk ava bû. Dûre wê dewletê, ango dewleta tirk, kurd înkar kir, kurdî qedexe kir û bakurê Kurdistanê kir mêtingeha xwe. Heke kurd dev ji "sofîtiya" sosyalîzmê berdin û bi sîstemên federalîst ên wek Amerîkayê re têkiliya xwe çêkin wê bêtir bi ser bikevin.

Heke berê di navbera kurdan û Amerîkayê de hin pirsgirêk derketibin ev ji ber dijminatiya kurdan a Amerîkayê bû. Kurdan xwe di eniya sosyalîst de bi

***Di vir de a girîng ew e ku siyaseta kurdan li gorî îdeolojiyan nefesile, li gorî azadiya kurdan bifesile. Azadiya kurdan û Kurdistanê ji îdeolojiyan girîngtir e. Kurd ji bo çand û welatê xwe dixebitin, li ber xwe didin, derin çiyê, dimirin, ne ji bo sosyalîzm û îdeolojiyên din. Di kurdan de gerek têgehên "rizgarî" û "sosyalîzm"ê ji hev bên veçirandin, ji nav hev bên derxistin.***

***Îsraîl û Kurdistan gerek tifaq, hevalbendî û hevkariya navbera wan mezin be. Têkiliya kurd û cihûyan wê herdu neteweyan xurttir û temendirêjtir bike. Heke cihû û kurd li herêmê ne piştgirên hev bin jiyana wan nikare zêde bidome. Divê têkiliya kurd û cihûyan ne bi tenê siyasî be, her wiha di huner, aborî, werzîş û zanistiyê de jî gerek yekîtî û têkiliya wan hebe û xurt be.***

cî kir û Amerîka kir dijminê xwe. Tu yekî bikî dijminê xwe ew ê jî te bike dijminê xwe. Ev dijminatî bû sedem ku Amerîka bi ser kurdan de were û zerarê bide kurdan. Dijminên kurdan serdestên kurdan in, ne Amerîka û hwd welatên lîberalîst. Dibe ku bazar û têkiliya Amerîkayê bi serdestên kurdan re hebe, divê vêya Amerîkayê nake dijminê kurdan. Heke kurd dostanî û dijminatiya xwe li ser bingehên wiha ava bikin, wê meselê li ber xwe pir belav bikin û nikaribin ji nav derkevin.

Ewropa û Amerîka ne heman tişt in. Kurdan ti xêr ji Ewropaya kapîtalîst nedît lê Amerîkaya federalîst ji bo kurdan baştir e. Jixwe Amerîka bi xwe jî bindestê Ewropa bû. Heke kurd têkiliya xwe bi welatên nû, yên ku berê bindestên Ewropayê bûn, ên wek Kanada, Amerîka, Awûstralyayê re çêkin ev ê siyasteke baştir û rasttir be. Kurd û ev welatana wê bêtir li hev bikin û ji hev fam bikin. Ev welat hê ciwan in, hîn genî nebûne û neriziyane.

Di vir de a girîng ew e ku siyaseta kurdan li gorî îdeolojiyan nefesile, li gorî azadiya kurdan bifesile. Azadiya kurdan û Kurdistanê ji îdeolojiyan girîngtir e. Kurd ji bo çand û welatê xwe dixebitin, li ber xwe didin, derin çiyê, dimirin, ne ji bo sosyalîzm û îdeolojiyên din. Di kurdan de gerek têgehên "rizgarî" û "sosyalîzm"ê ji hev bên veçirandin, ji nav hev bên derxistin. Ancax wiha siyaseta kurdan dikare zelal û xurt bibe. Îdeolojî di pêvajoya rizgariya neteweyan de astengî ne, bar in. Kurd ji ber barê giraniya îdeolojiyan nikarin rehet, çalak û baş tevbigerin. Têkoşîna her kurdî, çepgir, sosyalîst, rastgir, dîndar gerek ne ji bo serkeftina îdeolojiya wî be, gerek ji bo azadiya welatê wî be. Gava kurd azad û serbixwe bibin jixwe sosyalîst an jî dîndar her kurd bi ser dikeve. Di kurdan de îdeolojî divê gava talî be, gava pêşî divê azadiya welat be.

Li Rojhilata Navîn têkiliya kurd û cihûyan dikare xurttir be. Îsraîl li herêmê ji bo kurdan welatekî girîng e. Wek çawa kurdan ji sosyalîstan ti xêr û qencî nedîtibe, heta niha ji misilmanan jî ti xêr û qencî nedîtiye. Helbet ev ne sûcê îslamiyetê ye, sûcê misilmanên xerab e. Dewletên serdestên kurdan, Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriye jî misilman in lê Kurdistan bûye koloniya wan. Zext û zora ku misilman li kurdan dikin, kafir li misilmanan nakin.

Li Rojhilata Navîn du netewe hene ku vana ji ên din cudatir in, tenêtir in: cihû û kurd. Kurd û cihû li Rojhilata navîn li gorî neteweyên din nifûsa wan kêmtir e, ew marjînalên herêmê ne. Ji ber wê, herdu milet mecbûr in têkilî û hevalbendiya wan hebe. Îsraîl û Kurdistan gerek tifaq, hevalbendî û hevkariya navbera wan mezin be. Têkiliya kurd û cihûyan wê herdu neteweyan xurttir û temendirêjtir bike. Heke cihû û kurd li herêmê ne piştgirên hev bin jiyana wan nikare zêde bidome. Divê têkiliya kurd û cihûyan ne bi tenê siyasî be, her wiha di huner, aborî, werzîş û zanistiyê de jî gerek yekîtî û têkiliya wan hebe û xurt be.

Divê kurd siyasetê bi hiş û aqilê xwe bikin ne bi hîs û ramanên xwe yên teolojîk û îdeolojîk. Siyaseta teolojîk û îdeolojîk bi kurdan dide windakirin. Ji bo kurdan a baş siyaseta neteweyî ye, siyaseta neteweyî ya realîst û rasyonalîst. Piştî avakirina welatekî azad, kî ji kîjan teolojî û îdeolojiyê be îcar serbest e. Kurd dikarin sosyalîstên xas û misilmanên xas bin lê divê berê neteweyî bin û welatê xwe rizgar bikin.

Ev nivîs ji rojnameya Xwebûnê hatiye wergirtin.

### Kî ye Rênas Jiyan?



Rênas Jiyan helbestvan, nivîskar û weşangerekî kurd e. Ji nav gelek berhemên wî herî zêde pirtûka bi navê Janya a di 1999'an de hat weşandin deng veda. Rênas Jiyan tevî xebatên xwe yên nivîs û weşangeriyê, ji rojnameya Xwebûnê re jî dinivîse.

# MEDYAYA KURD Û ASÎMÎLASYON




Medya Haber kanaleke kurd e ku bi Tirkî weşanê dike

**Ronî Riha**

> ***Ji çandê û ziman bigre heta nirxên civaka Kurd ên resen derbeyek giran xwarin û ket bin xetereyeke mezin. Lê yên herî zêde ji vê guhertina şaş re pêşengtiyê dikin û bask li hev dixin da ku qewmê xwe bînin ser dahfikê, bê guman medyaya "Kurd" bû.***

Bi dîlgirtina birêz Ocalan re di PKKê de guhertin û cûdatiyên bi çûk roj bi roj rûdan. Lê bi taybet di destpêka sala 2013an de (Ev dîrok jî dîroka dema di navbera birêz Ocalan û dewleta Tirk de pêvajoya aştiyê ya wek "Barış Süreci" dest pê kiribû) guhertinek hîn mezin ya ji xwestek û xeyalên Kurdistana mezin dûr, hîn zêde bi qayîlbûna "Tirkiyeyeke demokratik" di nav siyaseta Kurd de hêdî hêdî şax da. Dîsa di vê demê de projeya HDPê ya ku armanca wê çep û sosyalîstên Tirkiyeyê û kurdan di bin yek sîwanê de bînin cem hev, da ku çareseriya mesela Kurd û Kurdistanê di raya giştî de piştgiriyakek hîn xurt bibîne û bi awayekî demokratik mesele Kurd çareser bibe hat meşandin. Lê, ev pêvajo û pêngava ji hêla birêz Ocalan ve li Îmraliyê destpêkiribû, ji aliyê rêvebirên PKKê ve an şaş hat xwendin, an jî ji şaşan re bû derfetek zêrîn da ku doza Kurd û Kurdistanê ji bingeh û cewherê xwe derkeve û têkeve rêyeke xwar û şaş. Welhasil dema em li encamê binerin û li roja îro vegerin, hem di qada çandî û hem jî di qada siyasî de li holê şaşiyek zelal heye!

## Siyaseta kevokfiroş

Wan pêngavên şaş bi demê re him şexsiyetên şaş kirin xwedî hêz û hem jî ew kurdên di doza Kurdistanê de nerînbaz hêdî hedî tev bûn kevokfiroş li Rojhilata Navîn.

Rojhilata Navîn a ku garana keftar û qijika ye! Ev guhertina di destpêkê de biçûk û bê zirar dihat xuyakirin, bi demê re gotin, liv û tevgera civaka Kurd bi xwe re guhert û ew guhertin îro bi lez didome. Ji çandê û ziman bigre heta nirxên civaka Kurd ên resen derbeyek giran xwarin û ket bin xetereyeke mezin. Lê yên herî zêde ji vê guhertina şaş re pêşengtiyê dikin û bask li hev dixin da ku qewmê xwe bînin ser dahfikê, bê guman medyaya "Kurd" bû. Medyaya Kurd a xwedî dîrokek dirêj a bi xwîn û xwêdan...! Medya Kurd a ku niviskarên wê ji bo heqîqeta gelê xwe bînin ziman xwîn û xwêdana xwe kiribûn hibr!

## Rojnameya Kurdistan

Dema em bala xwe bidin rêwîtiya Medyaya Kurd, bê guman em ê rojnameya "Kurdistan" bibînin. Berî niha 126 sal berê, di 22ê Gulana 1898an de ji aliyê Mikdat Midhat Bedirxan li paytexta Misrê, li Qahîrê, rojnameya "Kurdistan" hejmara xwe ya ewil derxist. Lewma jî rojnameya "Kurdistan" di dîroka gelê kurd de yekemîn rojnameya kurdî ye. Rojnameya bi alfabeya erebî, lê bi zimanê kurdî derdiket, ji 1898an heta 1902an di şert û mercên zehmet de 31 hejmar weşand. Bedirxan ku 5 hejmarên yekem ên Rojnameya Kurdistanê derdixist, ji ber zextên dewleta Osmanî nikarîbû li Qahîreyê çapkirina rojnameyê bidomîne. Piştî ku Mîkdad Mîthad Bedirxan ji ber nexweşiya ku pê ketibû jiyana xwe ji dest da, birayê wî Abdurrahman Bedirxan berpirsyariya rojnameyê girt ser xwe û di berdewamiya rojnameyê de israr dike. Hejmara rojnameyê ya 6-19 li Cenev, hejmara 20-23 li London, hejmara 24-29 li Folkestone, hejmara 30-31 dîsa li

***Ev medyaya ku bi wan polîtîkayên şaş hat avakirin, ji xwe re kêmaqil, qelemşor û bernameçêker jî afirandin. Qelemşor û bernameçêker ne bi keda xwe derketin pêş lêbelê piraniya wan hatin afirandin. Bêyî xwedî bingeh û formasyona rojnamegeriyê bin, bi carekê de bûn xwedî qelem û ekranan.***

Cenevê hat çapkirin. Jiyana weşana Rojnameya Kurdistanê ya ji bo deng û rengê gelê Kurd xwe kiribû hawar, piştî hejmara 31ê di sala 1902an de bi dawî bû.

Piştî bêdengiyek 30 salî, vê carê dîsa li derveyê welat kovara "Hawar" xwe ji qîrîna Kurdistanê re kir hawar û bi gaziya gelê xwe hat. Neviyê Mîrê Cizîrê Mîr Bedîrxan, Celadet Alî Bedîrxan yekemîn hejmara kovara Hawar di 15ê gulana 1932an de li paytexta Sûrîye li Şamê derxist û heta 15ê tebaxa 1943an 57 hejmar hat weşandin. Kovara Hawar ku di dîroka weşangeriya kurdî de xwedî cihekî girîng e, alîkariyeke wê ya mezin ji bo zimanê kurdî çêbûye. Ev pê û pîvanên nivîsa Kurdî ya bi alfabeya latînî ya em îro bi kar tînin hemû bi xêra "Hawara" do ye. Di kovarê de bi giranî lêkolîn, çîrok û helbestên bi kurdî, ji wêjeya kurdî nivîsên bijartî hatin weşandin. Bi vi awayî, Hawar di wêje û mijara ziman de bû ekolek û heta sala 1943an weşana xwe berdewam kir. Kovara Hawarê hem di cîhana nû de bi alfabeya Latînî gaveke dîrokî avêt û hem jî ji bo dîroka Kurd a bi nivîskî û bi kurdî mîladek nû da destpê kirin.

Celadet di hejmara pêşîn û di rêzên destpêkê de wiha bang li gelê kurd dikir:

"Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe-nasîn e. Xwe-nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê ye."

## Keda Musa Anter

Bê şik û guman, di destpêka salên 1960an, yên ku komara Turkiyê bûbû dojeha Kurd, ew salên ku fîtika kurdî jî qedexe bû, di wê dojehê de Mûsa Anter bi qelema gelê xwe, xwe pêça û bû zimanê gelê xwe yê qedexe. Mûsa Anter û hevrêyên xwe bi avakirina gelek rojnameyan bû peyamberê qîrîna heqîqeta gelê Kurd.

Ji ber ku Anter rastiya gelê kurd a qedexekirî û çapemeniya Tirk nedianî ziman diqîriya, gelek caran hat darizandin û bi kuştinê hat tehdîdkirin, lê wî berdewam kir. Kovar û rojnameyên nivîsên wî tê de hatin weşandin her tim temen kin bûn. Lê wî dev ji gotinê û dest ji qelemê berneda. Çend peyv an hevokên bi kurdî yên di nav gotarên wî de dihatin weşandin dibû sedema har û dînkirina rayedarên dewleta Tirk û hercar Anter û nivîskarên wan rojnameyan xwe li dadgehek dewleta Tirk ya bê edalet didîtin. Herî dawiyê cangoriyê medya Kurd Mûsa Anter di vê oxirê de li paytexta Kurdistanê, li Amedê ji hêla dewleta Tirk ve hat qetil kirin.

## Medyaya asîmîlasyonîst

Piştî kuştina Mûsa Anter, medya û rojnamevanên Kurd yên ku qaşo wê li nirx û pîvanê Mûsa Anter xwedî derketana û ji bo rastiya Kurd û Kurdistanê biqîriyana, îro pişta xwe dane zimanê Kurdî û rastiya Kurdistanê û bûne begçî û berdevkên siyaseta Dewleta Tirk a asîmilasiyona çand û zimanê Kurd û Kurdistanê. Sed heyf û mixabin!

Mînaka herî mezin jî bê guman wek me li jor bahs kir, ji 2013an vir de ew guhertina bizrên wê li çiya û zozanên Kurdistanê hatin çandin bi xwe re him medyakek nuh ava kir û him jî qelemşorên bên kok û bingeh, qelemşorên "Xwe-Nenas"...! NIha bi dehan rojname, ajans û televizyonên xitabî gelê Kurd yê Bakurê Kurdistanê dikin henin, lê bêyî Sterk TV yên din hemû bi zimanê Tirkî weşanê dikin. Lewra îro di mala her Kurdî de, di telefona her Kurdî de medyakek "KurTurk" heye

Wek mînak; Serxwebûn (kovar), Özgür Politika(rojname), Anf, (ajans) Mezopotamya ajansı, (ajans) Yeni yaşam gazetesi (rojname), Roj News (ajans), Jinha (ajans), Anha (ajans) Diha (ajans) Medya Haber (Tv). Ev Rojname, kovar, ajans û Tv bi giranî an tevahî bi Tirkî weşanê dikin. Bêyî "Yeni Yaşam Gazetesi" hemû jî li qadek bê zext û zor weşanê dikin, yanî li Ewrûpa...!

Tiştê din ê balkêş jî, ji bo xatirê vê çapemeniya bi zimanê Tirkî him KCK bi piranî daxuyaniyên xwe bi tirkî dide û hem jî rêvebirên KCKê derdikevin pêş ekranên vê medyayê û bi tirkî bang li gelê kurd dikin. Dîsa ji bo xatirê heman medyayê fermandarên YPGê yên li axa Rojavayê Kurdistanê mezin bûne di ekranan de bi saetan bi zimanê tirkî dipeyivin. Gelo li holê şaşiyekek nîne???

## Qelemşor hatin afirandin

Ev medyaya ku bi wan polîtîkayên şaş hat avakirin, ji xwe re kêmaqil, qelemşor û bernameçêker jî afirandin. Qelemşor û bernameçêker ne bi keda xwe derketin pêş lêbelê piraniya wan hatin afirandin. Bêyî xwedî bingeh û formasyona rojnamegeriyê bin, bi carekê de bûn xwedî qelem û ekranan. Lewra bi serxweşiya payeyên heq nekiribûn, rojnamevantiya Medyaya Kurd kirin qada fantaziyên xwe yên şexsî. Herku ji şaşiyan re di Medyaya Kurd de çepik hatin lêxistin, şaşî ewqas mezin bûn. Heman rojnemevan û medya di bin kontrola wan de roj bi roj dev ji pîvanên doza kurd û pêşengên Medyaya Kurd berdan û bê bênder û bingeh weşangeriyeke şaş meşandin. Heman kes û kesok hîn jî bi hêz û bi lez heman şaşiyan didomînin.

### Kî ye Ronî Riha?




Ronî Riha rojnamevan û nivîskarekî ji Bakurê Kurdistanê ye. Riha demeke dirêj li Swîsreyî nûçegîhaniya Stêrk TV kir. Nivîsên rojnamevan di çapemeniya Swîsrî de jî tên weşandin. Riha di heman demê de xwediyê du pirtûkên bi navê Loristan û Savaş Duvaklari ye.



welatinfo @infowelattv infowelat

# DOKTRÎN ŞERÊ TUNEL Û GERÎLA YE

***Fermandarê Kurd Murat Karayilan derbarê şerê li Başûrê Kurdistanê ku di 2021'an de bi êrişa artêşa Tirk dest pê kir, agahiyên girîng dan.***



Murat Karayilan

Fermandarê Kurd Murat Karayilan got, ew ê bi doktrîna nû artêşa Tirk têk bibin. Fermandarê biryargeha Navendî ya Hêzên Parastina Gel (HPG) Karayilan derbarê şer de ji Stêrk TV'ê re axivî. Karayilan derbarê şerê li Başûrê Kurdistanê ku di 2021'an de bi êrişa artêşa Tirk dest pê kir, agahiyên girîng dan.

Karayilan bersivê da pirsa li ser windahiyên dawî yên li Bakur û wiha axivî:

"Bi taybetî windahiyên me yên li Amedê, girîng bûn. Yên li Botan, Dêrsim, Mêrdîn, Serhed, Garzan, Cîloyê hemû girîng bûn. Lê li Amedê şehadeta heval Dilgeş û du hevalên pê re, ne ji rêzê bû." Fermandarê Kurd got, di 2023'an de "Şer ji Serhedê heta Garzanê, Amed, Dêrsim, Mêrdîn, Botan, Zagrosan (hem Cîlo û hem jî li eyaleta Geverê) li her devera Kurdistanê qewimî."

## Doktrîna şer

Agahiyên herî balkêş ên Karayilan di derbarê doktrîna nû ya şer de bû. Fermandarê HPG'ê got, ji ber doktrîna nû artêşa Tirk nikare encamê bigire.

Karayilan doktrîna şer wiha îzeh kir:

Doktrîna me ya şer çi ye? Em şerê tunelan û gerîlatiyê dikin yek. Em bi hev re dimeşînin. Herdu jî wek mirovek ku li ser du lingan dimeşin. Hevdû xwedî dikin, xurt dikin, ji ber vê yekê li hember her cure êrîş û çekan li ber xwe didin. Bê şik gerîla ne gerîlayekî klasîk e, gerîlayekî tîmê ye, pispor e û xwe li herêmê vedişêre. Mîna xeyalet e. Kengî bixwaze derdikeve, kengî bixwaze wenda dibe. Tîmên qadê bi vî rengî şer dikin.

***Doktrîna me ya şer çi ye? Em şerê tunelan û gerîlatiyê dikin yek. Em bi hev re dimeşînin. Herdu jî wek mirovek ku li ser du lingan dimeşin. Hevdû xwedî dikin, xurt dikin, ji ber vê yekê li hember her cure êrîş û çekan li ber xwe didin.***

Fermandarê Kurd tunelan wekî "kelehên binerdê" pênase kir û da zanîn, rêbaza bikaranîna tunelan a li Çîn û Vîetnamê ne wekî ya Kurdistanê ye.

Di dawiya daxuyaniyê de KCK'ê çareseriya xwe ya ji bo problemên Tirkiyeyê îfade dike û daxwaza dilê xwe bi eşkereyî dibêje.

## Dagirkirin ne kontrolkirin e

Murat Karayilan da zanîn leşkerên Tirk 3 sal in dixwazin Zapê dagir bike lê digel dagirkirina hin deveran, nikarin herêmê têxin bin kontrola xwe.

Fermandarê Kurd li ser vê mijarê wiha axivî:

"Yanî şêwazê ku îro Gerîlaya Azadiya Kurdistanê dimeşîne şêwazeke nû ye û hêzên dagirker bi teknîkên pêşketî nikarin bi hêsanî kontrol bikin. Dewleta Tirk 3 sal in ji rojava û rojhilat ve nekarî ber bi ava Zapê ve bê; Yanî nehatiya Ava Zêyê, nikare were. Her du aliyên avê di destê gerîla de ye."

## 91 helîkopter derb xwarin

Karayilan PDK'ê bi piştgiriya dewleta Tirk re sûcdar kir û diyar kir, artêşa Tirk hebûna PDK'ê ya nêzîkî qadên gerîla ji bo êrişê bi kar tînin.

Fermandar Karayilan got, digel vê jî artêşa Tirk windahiyên mezin dide û ji bo jî ji 2022'an vê mînakê da:

"Mînak di şerê sala 2022'yan de 11 helîkopterên şer ên dewleta Tirk hatin xistin û îmha kirin; 80 helîkopter jî hatin derbkirin. Derb lê ket, agir bi helîkopteran ket, nekarîn leşker danin û paşve çûn. Bi giştî 91 helîkopterên şer û Skorsky hatin derbkirin. Îsal pêk nehat. Dibe ku 4-5 hatine derbkirin. Yên hatine xistin tune. Ji ber çi? Ji ber ku îsal li araziyan nayên daxistin, li navenda PDK'ê dadixin. Heval nikarin lêxin. Bi vî rengî PDK'ê bi kar tîne."

# KURD ROJHILATÊ KURDISTANÊ TENÊ HIŞTIN

***digel hemû desteka ku Rojhilatê Kurdistanê daye hemû herêmên Kurdistanê, herêmên din ên Kurdistanê piştgiriya ku dihat hêvikirin nedane serhildana li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê.***



Komeke Pêşmergeyên ji Rojhilatê Kurdistanê. /Flicr

Serhildana Kurdan a li hember dewleta Îranê netewperestiya modern a Kurdan derxist holê. Lêbelê serhildana wan a dawî ji Kurdên li welatê din kêm desteke werdigire.

Kurdistana Îranê ku wekî Rojhilata Kurdistanê an Rojhilat jî tê zanîn, xwedî dîrokeke dirêj a serhildana li hemberê qraliyet û dewletên Pers û Îranê ye.

Di dema modern de ev, bi serhildana Şêx Ubeydulahê Nehrî ya di salên 1880'an de dest pê kiriye. Serhildan di salên 1920'an de bi Şimko Şikak, di salên 1930'an de bi Qadam Xeyr, di 1946'an de bi Komara Kurdistanê ya Qazî Mihemed û bi tevlîbûna Kurdan a şoreşa 1979'an û berxwedana li dijî Komara Îslamî ya di salên destpêkê yên 1980'an de bi berdewam kiriye.

Di demên dawî de, piştî qetilkirina jina Kurd Jîna Mahsa Emînî li paytexta Îran Tehranê, Kurd çirûska serhildaneke neteweyî ya di bin rêvebiriya jinê de dan destpêkirin.

Ev parçeya Kurdistanê ji bo tevgerên berxwedanê yên Kurd ên ji Tirkiye, Iraq ê Sûriyeyê roleke girîng pêk aniye. Ligel vê jî, di sedsala dawî de ji bo penaberên ji zilma Tirkiye û Iraqê reviyane bûne stargehekê.

***Li Îranê tu saziyên medyaya azad û serbixwe tune ne. Saziyên sereke yên medyayê di destên hukumetê de ne û ji aliyê wê vê tên kontrolkirin û çarçoveya wan a hiqûqî tê diyarkirin. Heman rewş ji bo medyaya Kurdistanê jî eynî ye.***

Bi hezaran Kurdên di dema jenosîda Enfalê de ji rejîma Beas reviyane, xwe li Rojhilatê Kurdistanê girtine. Di heman demê de, bi armanca li dijî dewleta Iraqî şer bikin, hêzên Kurdên Rojhilat bi Kurdên Başûr re tifaqê kirine. Di dema dawî de, gelê Rojhilatê Kurdistanê bi tevahî destekê dan Referandûma Serxwebûna Kurdistanê ya 2017'an. Di Şoreşa Rojava de, Kurdên ji Rojhilatê Kurdistanê bi riya beşdariya şerê li dijî DAIŞ'ê piştgiriya xwe nîşan dan. Viyan Peyman, fermandareke YPJ'ê ya li Kobanê di nava Kurdên Îranê de yek ji kesa herî zêde hatiye naskirin ku tevlî hêzên YPG û YPJ'ê bûye.

Lê digel hemû desteka ku Rojhilatê Kurdistanê daye hemû herêmên Kurdistanê, herêmên din ên Kurdistanê piştgiriya ku dihat hêvikirin nedane serhildana li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê.

Li Rojava (Bakurêrojhilatê Sûriyeyê) û herêma Kurdistanê ya Iraqê, di hefteyên ewil ên serhildanê de bi tenê çend çalakî hatin kirin. Ev jî li gorî gelek Kurdên li Rojhilatê Kurdistanê hêvî dikirin biçûktir û kêmtesîr bûn.

Hin sebeb hene ku mirov dikare bi wan vê bersiva ne têr îzeh bike. Ev analîz wê li ser çar sebeban bisekine: li Îranê berdestbariya enformasyona kontrolkirî, famkirina global a ji bo Îran û Rojhilatê Kurdistanê, weşana medyaya Kurd ku li ser berjwendiyên partîzaniyê pêk tê û zilma zimanî.

## Li Îranê peydekirina enformasyonê

Li gorî Indeksa Azadiyê ya Çapemeniya Cîhanê ya Rojnemavanên Sînornenas, di warê azadiya çapemeniyê û peydekirina agahiyan de Îran yek ji welatê herî xerab ê cîhanê ye. Rêza Îranê di nava 180 welatên cîhanê de 178. Indeksa Mafên Mijrov a Yekitiya Ewrûpayê Îranê di nava 165 welatan de di rêza 160 de bi cî dike û bi vî awayî, Îranê yek ji welatekî herî zêde ne azad û ji cîhanê îzole bûye nîşan dide.

***Dîskûrsa heyî ya mafên mirov ên derbarê Îranê de perspektîfa Faris ji xwe re esas digire. Ev yek ji aliyê weşanên medyayê yên mezin ên mixalefetê wekî Iran International, BBC Farisî, VOA Farisî, Independent Farisî û Manoto TV tê destekirin.***

Li Îranê tu saziyên medyaya azad û serbixwe tune ne. Saziyên sereke yên medyayê di destên hukumetê de ne û ji aliyê wê vê tên kontrolkirin û çarçoveya wan a hiqûqî tê diyarkirin. Heman rewş ji bo medyaya Kurdistanê jî eynî ye. Rojnamegerên serbixwe û aktîvîstên medyayê yên li Kurdistanê, ji bo weşandina enformasyonê û têkiliya wan a bi medya û rêxistinên navneteweyî rastî dozan tên. Hema hema hemû platformên medyaya sosyal hatine qedexekirin an astengkirin. Di dema serhildana dawî de, bikarnîna înternetê ji berê bêtir hate bisînorkirin.

Ji salên 1980'an û vir ve, rejîma Îranê ji aliyê derfetên fîzîkî ve parêzgehên Kurd îzole kiriye. Rejîm ambargoyan dane ser herêmê ku dibe sebeb ji aliyê aboriyê rewş xerabtir bibe. Di encama berxwedana bi dehan salan a li dijî rêvebiriya Tehranê, li Kurdistanê hebûneke mezin a leşkerî ya Îranê pêk were.

Ev faktor, bidestxistina enformasyona xwedî qelîteyeke bilind ji Kurdistana Rojhilat a ji aliyê medyaya navneteweyî, rojnameger û aktîvîstên mafên mirov hema hema bê îmkan dike. Heta ji bo gelek Kurdan, rastiyên derbarê vê herêmê de kêmzêde şolî ne.

## Famkirina Navneteweyî ya derbarê Îran û Kurdistanê de

Dewleta Îranê ne tenê sebeba kêmasiya enformasyona derbarê Rojhilatê Kurdistanê ya li cîhanê ye. Welatên Rojava, Komara Îslamî di çarçoveya gefên ewlehiyê ku li dijî welatên din pêk tîne, nîqaş dikin. Ev gef, bernameya nukleerê ye û bikaranîna komên girêdayê Îranê ne ku dibin sebeba bêîstiqrariyê. Binpêkirinên sîstematîk ên mafên mirov, bi taybetî jî yên li dijî kêmarên etnîk zêde balê nakişînin.

Dîskûrsa heyî ya mafên mirov ên derbarê Îranê de perspektîfa Faris ji xwe re esas digire. Ev yek ji aliyê weşanên medyayê yên mezin ên mixalefetê wekî Iran International, BBC Farisî, VOA Farisî, Independent Farisî û Manoto TV tê destekirin.

Weşan piranî ji aliyê welatên wekî Erebistana Siûdî, Brîtanya û Amerîkayê ve tên fînansekirin. Ev weşan ji pozîsyoneke ku kêmaran biyanî û nebaş nîşan dide tê kirin. Bo nimûne, Kurd bi îdiaya ew desteкê didin malbata Pehlewî û fikrên monarşîst tên sûcdarkirin.

Aktîvîstên Îranî û rojnamegerên ji bo rêxistinên mafên mirov û weşanên li Rojava xebatê dikin, piranî dibin xwedî helwesteke nêzîkî vê. Ew, mafên kêmaran îhmal dikin û perspektîfeke polîtîk ku wan li derve dihêle pêşniyaz dikin. Dema ev kes li ser kêmarên Îranê nûçe çêdikin, piranî wan bi etnîsîte, ziman an ola wan pênase nakin. Ev jî dibe sebeba famkirineke wiha ku herwekî Îran ne welatekî pirçandî û pirzimanî ye.

Ev yek kêmasiya cidî ya zanîna li ser rewşa Kurdan û kêmarên din ên li Îranê hîn bêtir xurt dike. Bi vî awayî bandora zilma dewletê ya li ser enformasyonê berfireh dibe.

***Dema ev qenal di weşanên xwe de cî didin Kurdistana Rojhilat ew bi giranî nûçeyên çandî û olî an mijarên din ên dewleta Îranê destûrê dide diweşînin.***

***Wekî mînak, hem Rudaw hem jî Stêrk-TV belgefîlmên derbarê jiyana rojane ya gelê Kurd ê li Rojhilatê Kurdistanê û Xorasanê ya li bakurêrojhilatê Îranê de ku li ser van mijarên ne xetere ne, diweşînin.***

## Partîzaniya medyaya Kurd

Faktora din a dibe sebeba vê rewşê têkiliyên di navbera medyaya Kurd û berjewendiyên partiyên siyasî yên Kurd in.

Partiyên sereke yên Kurd ên li herêmên din ên Kurdistanê ku di nava wan de PDK, YNK û PKK'ê jî hene, bi hukumeta Îranê re xwedî têkiliyên dîrokî û stratejîk in.

Ev qenalên Kurdî ji bo bikaribin li Îranê weşanê bikin sansura dewletê qebûl dikin. Bo nimûne, ofîsa Kurdsata girêdayî YNK'ê li Tehranê heye û Rudawa girêdayî PDK'ê di nava Îranê û Rojhilatê Kurdistanê xwedî çend nûçegîhanên ne fermî ne. Destûr nayê dayîn ku nûçegîhanên wan mijarên siyasî, civakî, aborî, mafên mirovan an meseleyên ku bi gelemperî li dijî polîtîka û berjewendiyên hukumeta Îranê ne nûçeyan çêkin.

***Li Rojhilatê Kurdistanê piraniya aktîvîst, saziyên medyayê û rêxistinên mafên mirovan Kurdiya Soranî û Farisî diaxivin û dinivîsin. Kêm Kurdên ji herêmên din ên Kurdistanê bi van zimanan dizanin.***

## Zilma zimanî

Kurd ji damezrandina dewletên modern Îran, Tirkiye, Iraq û Sûriye û vir ve rastî zilma zimanî tên. Di encama vê de, ji bo Kurdên ji herêmên cuda û axêverên zaravayên cuda yên Kurdî dijware bi hev re di nava ragihandinê de bin. Ji bilî vê, zimanekî hevpar ê duyemîn ê Kurdan jî tune ye: ew bi Farisî, Tirkî, Erebî an hejmareke zimanên Ewrûpî diaxivin.

Li Rojhilatê Kurdistanê piraniya aktîvîst, saziyên medyayê û rêxistinên mafên mirovan Kurdiya Soranî û Farisî diaxivin û dinivîsin. Kêm Kurdên ji herêmên din ên Kurdistanê bi van zimanan dizanin. Hemû aktîvîst, rêxistin û medya ne xwedî derfetên weşandina nûçe û naverokê ya bi zimanên din in.

Ev jî dibe zehmetiyek ku Kurdên ji herêmên din, yên li diyasporayê û çavdêrên navneteweyî rewşa li Rojhilatê Kurdistanê bişopînin. Bi berfirehî bikaranîna medyaya sosyal û înternet, bi taybetî jî ji aliyê ciwanan kir ku di vê meseleyê de rewş piçekî baştir bibe.

## Encam

Di 20 salên borî de, rewşa li Rojhilatê Kurdistanê ji berê xerabtir bû. Ji xeynî dijwariyên aboriyê yên Îranê li ser Kurdan ferz kir, Kurd di heman demê de rastî hemû formên zilmê, pêşdarazî û bêedaletiyê hatin.

Serhildana ku bi navê Jîna Emînî dest pê kir, di asteke pir mezin de ku mirov bi zehmetî jê bawer dike balê kişand ser Rojhilatê Kurdistanê ku şoreş lê dest pê kir. Nasnameya Kurd a vê şoreşê û slogana wê ya "Jin, Jiyan, Azadî" ji ber faktorên li jor me qal kir û herwiha ji ber bandora medyaya Îranê û aktîvîstên li welatên Rojava ji holê hate rakirin, hate guherandin û wekî nirxeke Îranî hate pêşkêşkirin.

Ligel vê tunekirina ku ji aliyê kesên ne Kurd in ve hate kirin, Kurdên li parçeyên din ên Kurdistanê piştgiriya ku ji bo serfiraziyên din ên Kurd nîşan didan, di heman astê de ji bo Kurdên ji Rojhilatê Kurdistanê û têkoşîna wan nîşan nedan.

Di encama vê de, digel ku li hemberê Îran, Tirkiye, Iraq û Sûriyeyê navendeke dîrokî ya berxwedanê ye, Rojhilatê Kurdistanê hate îhmalkirin û hate jibîrkirin.

### Kî ye Gordyaen Benyamîn Jermahî?

Gordyan Benyamîn Jermahî parazvanekî mafên mirov a Kurd e ku li Urmiyeya li Rojhilatê Kurdistanê ji dayîk bûye. Ew endamê rêxistineke mafên mirovan e ku binpêkirinên mafên mirov ên li Rojhilatê Kurdistanê tomar dike. Ji sala 2000'î û vir ve, ew dokumanan pêşkêşî saziyên navneteweyî ku di din ava wan de UNHCR û Forûma Neteweyên Yekbûyî ya Rojhilata Navîn û Afrîka jî hene, dike. Ew di heman demê de damezrînerê platforma Gelê Kurdistan a Instagramê ye ku di warê bilindkirina hişmendiya ji bo meseleyên bi Kurdan re eleqeder xebatê dike. Ew wê platformê ji bo parçeyên cuda yên Kurdistanê û diyasporayê bigihîne hevdûdû û ji bo mirovên pêdiviya wan hene fonan berhev bike, bikar tîne.

*Ev gotar cara ewil di malpera Kurdishpeace.org de de bi Îngilîzî hatiye weşandin. Sernivîsa orjînal a gotarê "Çima Kurd herêmên Kurdan nikarin destekê bidin serhildana Kurdan a li Îranê?" ye. Gotar ji aliyê Necat Ayaz ve hatiye wergerandin.*




Rojhilatê Kurdistanê /Harîte: Enstîtuya Kurd a Parîsê

# DEMA BRÎTANYA PIŞTGIRÎYA ŞERÊ QIRKIRINA KURDAN KIR

***Hikûmetên muhafazakar û karker piştgirî dan êrîşa hovane ya Bexdayê ya 60 sal berê ya li ser Kurdan, ji ber ku dizanibûn ku dibe ku bibe jenosîd, dosyayên ku nepenî hatine eşkerekirin nîşan didin. Îngilîzan hewl da ku Neteweyên Yekbûyî li ser îdiayên jenosîdê li Iraqê nîqaş neke.***



Komeke Pêşmergeyên Kurdistanê /Saradistribution

Piştî ku rejîma Iraqê di sala 1963'an de li dijî Kurdan "kampanyaya terorê" dabû destpêkirin, wezîrên Îngilîstanê hinartina çekan ji bo rejîma Iraqê zêde kirin.

Bi hezaran rokêt ji Bexdayê re hatin şandin û dizanîn ku ew ê ji bo wêrankirina gundên kurdan bên bikaranîn

Îngilîzan hewl da ku Neteweyên Yekbûyî li ser îdiayên jenosîdê li Iraqê nîqaş neke

Hikumeta Kedê guh neda daxwaza rêberê kurd ji bo rêgirtin li destpêkirina êrîşên çekên kîmyayî yên Iraqê li dijî kurdan.

Karmendekî ji Wezareta Derve ya Britanî nivîsîye ku;

"Di Cotmeha 1963-an de, hukûmeta Brîtanî hinardekirina lewheyên rûxandina teqemeniyên bilind ji bo Iraqê pejirand, bi têgihîştina ku "dibe ku ew ê ... ji bo hilweşandina gundên kurdan werin bikar anîn",

Hikûmeta Bexdayê êrîşeke berfireh li dijî Kurdan li bakurê welêt dabû destpêkirin û Brîtanya ji bo piştgirîkirina wê çekan zêde dikir, dosyayên ji Arşîvên Neteweyî yên Brîtanyayê hatin eşkerekirin.

Hevkariya Brîtanyayê di wêrankirina gundên kurdan de di destpêka salên 1960-an de bû pêşengê siyasetên bi heman rengî yên di salên 1980-an de bi êrişa Seddam Husên ya ku li dijî kurdan pir naskirî bû.

Leşkerên iraqî di 10ê Hezîrana 1963an de dest bi kampanyaya xwe kiribûn, ji bo ku li hember daxwazên kurdan yên otonomiyê, pişka nefta Iraqê û dûrxistina leşkerên ereb ji herêma bakurê Kurdistanê derkevin.

## Kampanyaya terorê

> ***Wan "niyeta Îraqî ya pêkanîna kampanyayeke terorê" dizanîbû. "***
>
> ***Brîtanya îxracata mezin a çekan pejirandibû û dizanibû ku ew ê li dijî kurdan bên bikaranîn."***

Rejîma Bexdayê di sibata 1963-an de bi darbeyeke bi xwîn a bi piştgirîya CIA-yê desthilatdarî girtibû ser xwe – cara yekem bû ku partiya niştimanî ya Baas a Iraqê bû desthilatdar.

Gumanên karbidestên Brîtanî ji tundiya kiryarên artêşa Iraqê yên li dijî Kurdan tune bûn. Wan "niyeta Îraqî ya pêkanîna kampanyayeke terorê" dizanîbû.

Di nav deh rojan de piştî destpêkirina êrîşê, artêş "niha bi eşkere mijûlî paqijkirin û wêrankirina gundên kurdan li taxa Kerkûkê li bakurê Iraqê bû",

Li gel ku du ji sê parên artêşa Iraqê li bakur hatine bicihkirin, Wezareta Derve da zanîn ku "hikûmeta Iraqê niha bi awayekî eşkere hewleke berfireh dide ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd bi yekcarî."

"Taktîkên hovane" ji aliyê artêşa Iraqê ve bi êrîşên hewayî yên li dijî Kurdan dihatin bikaranîn.

Balyozxaneya Brîtanya li Bexdayê di 22 Hezîran de ji Londonê re ragihand ku "hovîtîya rêbazên ku artêşê bikar tîne dibe ku ji bo demek pêş de têkiliyên Ereb/Kurd xera bike". "Artêş", wê bal kişand ser "serkeftina paqijkirina gundên kurdan li deverên nizm li derdora xalên xizan".

Û wiha pêde çû: "Rêbaza hatî pejirandin ew e ku gundan yek bi yek bi dest bixin, ji mesafeyek ewleh bi çekên tangan û topxaneyên meydanî topbaran bikin, hin caran jî hindik an jî qet hişyarî nadin şêniyan. Piştî navbereke ewle, Hêzên Parastina Neteweyî yan jî kurdên ku ji aliyê dewletê ve pere tên dayîn, ji bo talankirinê derbasî hundir dibin."

"Di hinek rewşan de, wek mînak li taxên Kurdan ên Kerkûkê, bi buldozeran malan dixin. Netîce ew e ku mêr dadikevin zozanan, jin û zarok gelek caran ji bo debara xwe tên hiştin û gund terik û heta niha bêdeng dimîne".

Wezareta Derve da zanîn ku di kampanyaya Bexdayê ya ji bo berjewendîyên Brîtanyayê de hin metirsî hene. Ev jî ew bûn ku "dijminatiyên neserkeftî dikarin rejîma niha ya Iraqê bixe metirsiyê" û ku şer dibe ku derfetên alozkirina Rûsyayê li Kurdistanê zêde bike.

Her wiha ditirsin ku aloziya Kurdan li Tirkiye, Îran û Sûriyê belav bibe û tesîsên neftê yên Iraqê zirarê bibînin.

Nebûna eşkere di lîsteya Wezareta Derve de, bandora şer li ser gelê Kurd bû.

"Brîtanya îxracata mezin a çekan pejirandibû û dizanibû ku ew ê li dijî kurdan bên bikaranîn."

Di dosyayan de diyar dibe ku Sir Roger Allen, Balyozê Brîtanyayê, di destpêkê de Bexdayê teşwîq kir ku bi Kurdan re lihevkirinekê bike, lê piştî destpêkirina kampanyayê, Brîtanya bi awayekî eşkere piştgirî da rejîma Iraqê.

Berî ku Bexda di meha Hezîranê de dest bi operasyonê bike, Brîtanya hinartina çekan ya mezin pejirandibû û dizanîbû ku ewê li dijî Kurdan bên bikaranîn.

Di dosyayekê de tê gotin ku; Alec Douglas Home, sekreterê derve di hikûmeta Harold Macmillan de, "bi fikar e ku bi giştî pêdivîyên çekan ên Iraqê bi lez û bez werin cîbicîkirin"

Di 11 Avrêlê de wezîrên Brîtanî îxrackirina 250 barhilgirên zirxî yên Saracen pejirandibûn, ku tê zanîn ku "dibe ku eger hewce bike ji bo bikaranîna li dijî kurdan".

Nivîs wiha dom dike: "Nûçeyên şer dibe sedema rexneya raya giştî li ser biryara me ya şandina çekan ji Iraqê re"

Fo

***Karbidestên Brîtanî haydar bûn ku êrîşa Îraqî ya ku piştgirîya wan dikir dibe ku bibe jenosîd.***

Di dosyayan de bandorên li ser Kurdan nayên nirxandin, lê tenê bandor li ser têkiliyên giştî tê kirin: "Nûçeyên şer dibe ku rexneyên raya giştî li ser biryara me ya şandina çekan ji bo Iraqê derbixe", di brîfîngekê de ji bo civata wezîran tê gotin.

Piştî du hefteyan ji kampanyayê re, Wezareta Derve diyar kir ku "em amade ne ku bi hemû hêza xwe kar bikin ji bo bicihanîna pêdiviyên Îraqî di warê çek û rahênanê de", tevî ku wezîr hîn jî dilgiran bûn ku şandina rokêtan dereng bixin ku Îraqî ji bo wan zextê dikin. ji bo li dijî Kurdan bikar bînin."

Lê di tîrmehê de, wezîrên muhafazakar hinardekirina 500 ji van "roketên teqemenî yên bilind" pejirand. Efserekî pilebilind ê hêza asmanî ya Îraqî, lîwa Hilmî, ji balyozê Brîtanî re gotibû ku "pêdiviya wî bi van çekan heye ji bo ku şerê xwe li dijî çekdaran bigihîne encameke bilez û serkeftî".

Dema ku jê re hat gotin ku Brîtanya dê rokêtan radest bike Hilmî "bi rastî spasdar" bû û fikirî ku serokê wî, fermandarê giştî yê hêzên asmanî yên Îraqî, "dê ji vê tevgera me kêfxweş bibe", balyoz destnîşan kir.

Her wiha hinardekirina cebilxane û rokêtên ji bo balafirên şer ên Hawker Hunter ên Iraqî yên ku berê ji hêla Brîtanya ve hatibûn şandin – "dîsa dibe ku ji bo li dijî kurdan bikar bînin"

Komîteyek wezaretê got, "Awantajên bazirganî yên girîng hene ku werin bidestxistin", û "çarçoveya hinardekirina leşkerî pir e". Lihevhatin bi 6 mîlyon £ bû.

Hikûmetê biryar da ku dayîna hin roketan dereng bixe. Karbidestek diyar kir ku "dibe ku nexwazî be ku keresteyên zêde bi comerdî bidin wan, ji ber ku ev yek tenê dibe ku wan teşwîq bike ku bi Kurdan re bêtir nelihev [sic] bin û eger şer derkeve û êrîşên roketî yên bêserûber çêbibin, dibe ku rexne li parlementoyê ji aliye xelkê ve bê kirin."

## Têkiliyên baş

Piştî ku Bexdayê êrişî Kurdistanê kir, hukûmeta Brîtanî zêdetir li ser radestkirina roketan, ku wek "tiştek hestiyar" tê binavkirin, ji ber ku "mebesta wan ji bo bikaranîna li dijî kurdan" e.

Di kurtenivîseke Wezareta Derve ya balyozxaneyan de ku siyaseta Brîtanyayê rave dike, diyar kir ku "me di hemû deman de fikiriye ku her çekek ku em pêşkêş dikin li dijî Kurdan were bikar anîn, lê em neçar ma ku vê argumanê li hember faktorên din binirxînin".

Ev faktorên din ew bûn ku têkiliyên baş bi mîrên nû yên Iraqê re pêşve bibin û wan ji pêdiviyên leşkerî yên Sovyetê dûr bixin.

Di dawiya Tebaxa 1963an de, bi berdewamiya şer û pevçûnan li Kurdistanê, hêzên asmanî yên iraqî 500 rokêtên Hunter kom kirin, ku 1000 rokêtên din di 1ê Îlonê de û 500 rokêtên din di 1ê Çiriya Pêşiyê de hatin radest kirin. Dûv re hin 18,000 zêdetir hatin peyda kirin.

Piştî vê yekê, erêkirina Brîtanîyayê ji bo peydakirina 280,000 guleyên cebilxane ji bo erebeyên zirxî yên Iraqê Saracen, bombeyên hawanê, 25 guleyên lîre, helîkopterên çekdar û maşînên jêrzemînê yên sterlîn hatin dayîn.

Brîtanya herwiha bi daxwazên Îraqî razî bû ku tîmekê bişîne wî welatî ji bo çakkirina çekên li ser tankên Centurion yên ku Brîtanya dabîn kirine. "Yek xala siyasî ya xapînok" di vê yekê de, Wezareta Derve da zanîn, berdewamkirina operasyonên Iraqê li dijî kurdan bû.

Karbidestên Brîtanî nehatin dîtin ku diçin nêzîkî deverên pevçûnan. Ji ber vê yekê, "eger tankên [sic] li Bakur bişkênin, wê tank bi tenê werin Bexdayê û li wir werin tamîrkirin".

Karbidestên Brîtanî haydar bûn ku êrîşa Îraqî ya ku piştgirîya wan dikir dibe ku bibe jenosîd. Wezareta Derve di deqeyekê de di Îlona 1963 de destnîşan kir ku "rêbazên Iraqê hovane bûn û dibe ku tawanbarkirina hewldana tunekirin an kêmkirina kurdan wekî hindikahiyek nijadî bidomîne".

Balyozxaneya Brîtanyayê ya li Bexdayê di 6ê Tîrmehê de ji Wezareta Derve re gotibû: "Kurd dîl nayên girtin lê tên gulebarankirin. Ji rayedaran hin îşaretên me hene ku dibe ku ev polîtîkayek bi zanebûn be."

*Ev gotar ji pirtûka Mark Curtis, Unpeople: Unpeople: Britain's Secret Human Rights Abuses (Binpêkirinên Mafên Mirovan ên Veşartî yên Brîtanyayê), jêgirtinek edîtorkirî ye. Mark Curtis edîtorê Declassified UK e, û nivîskarê pênc pirtûk û gelek gotaran li ser siyaseta derve ya Brîtanyayê ye. Wergera Kurdî ya vê gotarê ji malpera Rojevakurd hatiye wergirtin.*

Dûmahî: infowelat.com

# KONFEDERALÎZMA KERKÛKÊ Û SERDESTIYA IRAQÊ



Peykerê Pêşmergê yê li Kerkûkê /PUKmedia

**Necat AYAZ**

Rojnameya Ozgur Polîtîkayê weşandina nivîsên zirarê dide berjewendiyên Kurdan berdewam dike. Rojnameyê hema her hefte cî dide nivîsarên bi Tirkî ku rasterast êrişî bingeha neteweyî dikin. Piştî gotara Selahattin Erdem ku tê de kesên banga yekitiya neteweyî dikirin hatin sûcdarkirin, rojnameyê gotareke din a nivîskar weşand.

Erdem bi gotara xwe ya bi navê "Meseleya Kerkûkê û çareseriya neteweya demokratîk" xeta xwe ya dij-neteweyê bêtir eşkere kir. Nivîskarê O.Polîtîkayê got, di dîrokê de Parêzgeha Mûsilê ku hemû bajarên Başûrê Kurdistanê digirt nava xwe, parêzgeheke Kurd bû.

Tevî ku Erdem rastiyên dîrokî qebûl kir, di gotinên xwe yên derbarê Kerkûkê de dîsa vegeriya ser xeta xwe ya çep a li dijî destkeftinên Kurd.

## Netewperestiya Ereb, Tirkmen û Kurdan

Nivîskar bi van gotinan netewperestiya Tirkmen, Ereb û Kurd kir yek:

"Faşîzma AKP-MHP'ê û ajanên wan ên li Kerkûkê ragihandine 'Kerkûk bajarekî Tirkmen e.' Li gorî netewperestên Ereb 'Kerkûk teqez bajarekî Ereb e.' Digel ku hejmara wan gelek kêm be jî, netewperestên Kurd jî dibêjin 'Kerkûk bajarekî Kurd e.'" Erdem, bi vî awayî nasnameya cografîk a Kerkûkê ya wekî parçeyeke Başûrê Kurdistanê red kir.

Bi dûv vê re, nivîskar di îzeha ji bo sebeba pêkhatina meseleya Kerkûkê de, tevlî Ereb û Tirkmenan Kurdan jî bi netewperestiyê sûcdar kir. Li aliyekî din, Erdem îhtimala vegera PDK'ê ya Kerkûkê bi vê hincetê rexne kir û bi vî awayî jî nebû alîgirê hebûna partiyeke Kurd li vî bajarî:

"PDK bi riya îtîfaqa hêzên ne Kurd in re dixwaze bi tenê ew wekî siyaseta Kurd li Kerkûkê bimîne."

## Neteweyek bê ziman û bê ax

Nivîskarê O.Polîtîkayê wekî nivîsa xwe ya beriya vê, dîsa qala "neteweya demokratîk" kir û çareseriya "konfederalîzma demokratîk" pêşniyaz kir.

***Nivîskarê Ozgur Polîtîkayê Selahattin Erdem, bi riya ferzkirina nasnameya Iraqî ya li hemû Iraqê û Kerkûkê, “konfederasyona demokratîk a Kerkûkê” pêşniyaz kir.***

***Fabrice Balance tunebûna Kerkûkê ya di nava sînorên Kurdistanê de wekî xetereyeke li hemberê otonomiyê nîşan dabû.***

Erdem gotinên xwe yên herî sosret ên di vê gotarê de bi pênaseya “neteweya demokratîk” kir:
“
Neteweya demokratîk, bi awayekî azad xwejiyandina hemû nasnameyên neteweyî ya di bin nasnameya-jor a neteweyî ya ‘Iraqîbûnê de’ û tevlîbûna wan a ji bo yekitiya demokratîk ji xwe re esas digire.”

Û bi riya ferzkirina nasnameya Iraqî ya li hemû Iraqê û Kerkûkê, nivîskarê xwediyê vê gotara nîqaşbar “konfederasyona demokratîk a Kerkûkê” pêşniyaz kir.

## Kurtedîroka aloziya Kerkûkê

Kerkûk bajarekî Kurdistanê yê ku xwedî cihêrengiya etnîk û zimanî ye. Piştî damezrandina dewleta Iraqê, bajêr rastî polîtîkayên guherîna demografyayê hatiye. Hukumetên Iraqê xwestine hebûna nifûsa ereb li bajêr zêde bikin û vê jî bikin bingeha veqetandina bajêr ji Kurdistanê. Ev jî bûye sebeb, Kerkûk herdem di navbera kurd û dewletê de bibe navenda aloziyê.

Lewma jî di hevdîtinên Iraq-Kurdan de statuya bajêr xala herî krîtîk bû. Dema Hukumeta Iraqê bi lîderê kurd Mele Mistefa Barzanî re Peymana Adarê ya ji bo otonomiyê îmze kir, Kerkûk li derveyê peymanê hat hiştin. Ji ber statuya nezelal a Kerkûkê navbera kurd û Iraqê her ku çû xera bû. Barzanî di salên destpêkê yên 1970’an de daxwaza xwe ya ji bo bajêr herdem dûbare kir.

Hukumeta Iraqê guh neda van daxwazan û ji bo li Kerkûkê bi cî bibin, malbatên ereb teşwîq kir. Bexda alîkariya fînansî da malbatên şîî da ku koçî bajêr bikin. Bi teşwîqa partiya Beas bi dehezaran ereb li bajêr bi cî bûn. Di heman demê de kirîna milkan ji bo kurdan hat qedexekirin.

Kurd dîsa serî hildan û berxwedana wan di 1975’an de têk çû. Bi dûv vê re, rejîma Beasê lez da polîtîkaya erebkirina bajêr. Di vê dema polîtîkaya asîmîlasyonê de Çemçemal û Kelar ji Kerkûkê hatin veqetandin û bûn parçeyeke Silêmanîyê. Kîfrî jî bi ser parêzgeha Diyalayê ve hat kirin. Kurd, tirkmen û xrîstiyanên darê zorê ji bajêr hatin derxistin.

Ev polîtîkaya Iraqê di piştî 1991’an derket asta herî bilind. Gundên Kurdan ên li dora Kerkûkê hatin hilweşandin û li nava bajêr ji bo ereban bi hezaran xanî hatin avakirin. Tê ragihandin, heta 2003’an di navbera 200,000 û 300,000 kes ji Kerkûkê hatin derxistin.

Piştî 2005’an li derdora 225,000 kurd ji nû ve vegeriyan Kerkûkê û 53,000 ereb terka bajêr kirin. Lêbelê buhara kurdan a li Kerkûkê bi polîtîkayên şaş ên Hukumeta Herêmî ya Kurdistanê hilweşiya. Piştî Referandûma Serxwebûna Kurdistanê, hêza paramîlîter Heşdî-Şabî di 15-16 Cotmeha 2017’an de Kerkûkê dagir kir. Pêşmerge di berxwe neda û tevlî bîrên petrolê ji hemû aliyên Kerkûkê vekişiya. Statuya Kerkûkê hîn jî meseleya herî aloze di navbera Hukumeta Herêmî ya Kurdistanê û Iraqê de.

Erdem gotinên xwe yên herî sosret ên di vê gotarê de bi pênaseya “neteweya demokratîk” kir:
“
Neteweya demokratîk, bi awayekî azad xwejiyandina hemû nasnameyên neteweyî ya di bin nasnameya-jor a neteweyî ya ‘Iraqîbûnê de’ û tevlîbûna wan a ji bo yekitiya demokratîk ji xwe re esas digire.”

Û bi riya ferzkirina nasnameya Iraqî ya li hemû Iraqê û Kerkûkê, nivîskarê xwediyê vê gotara nîqaşbar “konfederasyona demokratîk a Kerkûkê” pêşniyaz kir.

## Fabrice Balance çi gotibû?



Fabrice Balance/CFRI

Lêkolînerê Fransî diyar kiribû, heta Kerkûk nebe parçeyeke Kurdistanê wê otonomiya Kurdan di xetereyê de be.

Hêjayî gotinê ye, çend roj berê Fabrice Balance bi gotareke xwe ya di malpera Navenda Fransî ya Lêkolînên Iraqê (CFRI) de hatibû weşandin, di derbarê Kerkûkê de gotinên balkêş kiribûn.

Nivîsa di bin sernivîsa “Ji Kerkûkê heta Dêrazorê: Otonomiya Kurdan di xetereyê de ye”, balê kişandibû ser girîngiya bajêr a ji bo Kurdistanê.


Lêkolîner diyar kiribû, “15 ji % rezervên petrola Iraqê li Kerkûkê ne” û “çavkaniyên li Kerkûkê destûrê dide, Hukumeta Herêmî ya Kurdistanê pêdiviyê bi butçeya Bexdayê nebîne ku bi Destûra Bingehîn a 2005’an ji bo wê hatiye terxan kirin.”

Bi vê kurteanalîzê, Balance tunebûna Kerkûkê ya di nava sînorên Kurdistanê de wekî xetereyeke li hemberê otonomiyê nîşan dabû.

# HANNIBAL, KURD Û DEMOKRATÎKBÛNA TIRKIYEYÊ

**Ali Engin Yurtsever**

> ***“Di dewsa em li bende demokratîkbûna dewletên kolonyalîst ku xwîna me vexwin jî ew ê têr nebin bisekinin û di vê riyê de hewl bidin, ‘an em riyekê din vekin an jî em riyekê din çêbikin’ û em ber bi paşeroja xwe ve bimeşin. Eger em vê nekin, ‘em ê wekî miletekî serî rakir, di ber xwe da lê ji ber ku pêdiviyên têkoşînê pêk nenanî di dawiyê de winda kir, di dîrokê de ciyê xwe bigirin.”***



Peykerê Hannibal /Wikipedia

Nivîskar Ali Engin Yurtsever di gotara xwe ya di malpera Nupel TV de li ser xetereyên li pêşiya têkoşîna Kurd nivîsî. Di gotara di bin sernivîsa “Hannibal bi biryar bû lê gelo em jî wiha ne?” de rexne li Tevgera Kurd hate kirin. Nivîskar got, “serhildana di pêşengiya PKK’ê de dest pê kir, çalakiyeke Kurdan a ji bo nivîsandina dîroka xwe bû.”

Yurtsever stratejiya dûbare ya Tevgera Kurd a li Bakurê Kurdistanê anî rojevê û bi van gotinên sergirtî vê yekê ji bo dewleta Tirk wekî serfirazî pênase kir:

“Dema mirov bikaribe rêxistinên serî hildane li ser heman xeta têkoşînê bisînor bike, ev yek wê herdem ji hêza li hember serî hatiye rakirin re xizmetê bike. Ji ber ku astengkirina gaveke pêşdeçûna têkoşînê, ji bo wan serfirazî ye.”

Nivîskar qala dijwariyên şerê rizgariya neteweyî û astengiyên li hember “Tevgera Azadiya Kurd” jî kir û got, “kesên dixwazin serkeftineke bi lez û bez pêk were divê hay ji vê realîteyê hebin.” Tevlî vê jî, Yurtsever bi “Lêbelê, divê pêşiya belavbûna fikra ku rojev xitimî ye û bi dûbareyê didome ya di nava gel de bê girtin. Şerê didome hem di warê leşkerî de hem jî di warê polîtîk de derbasî asteke bilind nabe û ev jî me bi ber bi rewşeke xetere ve dibe.”

## Kolan ciyê berxwedanê ye

Di gotarê de rexne li siyaseta legal a Kurd jî hate kirin û di dewsa Parlamentoya Tirkiyeyê de pêdiviya berxwedana kolanan hate destnîşankirin.
Yurtsever wiha nivisî:

“Berdevkên partiyekî ku miletekî ewqas dînamîk û xwedî problemên mezin temsîl dikin, divê tevlî milet li kolanan bin. Ji ber ku parlamento demeke dirêje êdî nikare polîtîkayê bimeşîne û çareseriyên polîtîk bibîne. Êriş li kolanan e û wê demê divê berxwedan jî li kolanan pêk be.”

## Hannibal û xetereya dûbareyê

> ***“Hannibal fermandarên xwe yên ku digotin ew ê nikaribin artêşê di çiyayên asê re derbas bikin, guhdarî nekir. Ew nebû wekî hin kesên ku gihîşt berpalên çiyê û ji vir vegeriya. Ew di dewsa pratîkeke dûbare de, bû xwedî biryara ji bo paşerojê.”***

Di dawiya gotarê de nivîskar qala çîroka fermandarê bi navûdeng ê Kartacayê Hannibal kir û bi vê mînakê bang li pêdiviya guherîna Tevgera Kurd kir:

“Hannibal fermandarên xwe yên ku digotin ew ê nikaribin artêşê di çiyayên asê re derbas bikin, guhdarî nekir. Ew nebû wekî hin kesên ku gihîşt berpalên çiyê û ji vir vegeriya. Ew di dewsa pratîkeke dûbare de, bû xwedî biryara ji bo paşerojê.”

Vê gotara balkêş bi van gotinên sergirtî yên ji bo polîtîkaya tewş a Tevgera Kurd a ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê bi dawî bû:

Di dewsa em li bende demokratîkbûna dewletên kolonyalîst ku xwîna me vexwin jî ew ê têr nebin bisekinin û di vê riyê de hewl bidin, ‘an em riyekê din vekin an jî em riyekê din çêbikin’ û em ber bi paşeroja xwe ve bimeşin. Eger em vê nekin, ‘em ê wekî miletekî serî rakir, di ber xwe da lê ji ber ku pêdiviyên têkoşînê pêk nenanî di dawiyê de winda kir, di dîrokê de ciyê xwe bigirin.” Ew ê ne riyekê em tê de bimeşin ne jî riyekê em bikaribin çêbikin li pêşiya me hebe.”

Ev nivîs ji malpera Nupel TV hatiye wergirtin.

# KURDISTAN WARÊ ÇANDINIYA GENIM E



Li Rojavayê Kurdistanê zeviyeke genim/Hawarnews

***Çandiniya genim ewil li başûrêrojavayê Deryaya Kaspînê hatiye kirin. Hemû erdên Kurdistanê dikeve nava vê herêma ji bo genim berhemdar e. Lêkolîn nîşan dide, dîroka çandiniya genim li vê herêma berfireh diçe 8,000 sal berê.***

Çandiniya genim ewil li başûrêrojavayê Deryaya Kaspînê (Hezar) hatiye kirin. Ev agahî di encama lêkolîna zanyarên ji Çînê hat bidesxistin.

Lêkolîn, bi gotareke zanistî di kovara Naturê de hat weşandin. Zanyar bi riya analîza genomên 795 cure genim warê ewil ê genim tespît kirin.

Herêma çandinî lê hatiye kirin welatên li başûrêrojavayê Deryaya Kaspînê ye.Hemû erdên Kurdistanê dikeve nava vê herêma ji bo genim berhemdar e. Ermenistan, Azerbaycan û erdên nêzîkî wan jî di nava vê herêmê de cî digirin.

Tevî vê jî, zanyar hîn jî nizanin cara ewil çandiniya genim cara ewil li kîjan devera li vê herêmê dest pê kiriye. Lêkolîn nîşan dide, dîroka çandiniya genim li vê herêma berfireh diçe 8,000 sal berê.

## Çandinî çawa belav bû?

Paşê, di navbera 7,000 û 5,000 salan de çandinî belavî Başûr û Rojhilatê Asyayê û Ewrûpayê bûye.


Genimê herêmê bi riya rotayên beriyên Asyayê, Çiyayên Hîmalayayê û Korîdora Hexi ya di navbera Çîn û Asyaya Navîn de gihîştiye Çîn û Hîndistanê.

Herçî Ewrûpaye, bi riya rotaya Derya Spî genim gihîştiye vê parzemînê.

Ji heman lêkolînê diyar dibe, ji vir 2,000 sal berê 82 ji % genomên genimê ewil guherî ne.

Ev jî ji ber tercîha mirovahiyê ya ji bo xurekên cihêreng pêk hatiye.

infowelat.com




Wargehên çandiniya genim hatiye kirin/Blog.csdn.net